



28.10.2009

Wekî me li ba hozanvanên dî yên mezin Ehmedê Xanî, Melayê Cezîrî, Feqê Teyran, Pertoyê Hekarî û Siyapûş bi karanîna „Pêdaçûnê“ mîna şêweyeke bilind a wêjevaniyê dîtiye, wê di nav helbestên hozanvanên me yên klasîkî yên din de jî bi ber çavên me keve, û yek ji wan helbestvanê bi nav û deng Xakî ye (1858-1909), ku navê wî yê rastîn Şêx Mihemed Can e. Seyda Zeynîlabidîn Zinar di sala 1992ê de, li bajêrê Stockholm (Swêd), bi navê çapxaneyê Pencînar (Weşana Çanda Kurdî), pirtûka wî ya giranbiha (Leyl û Mecnûn) ji tîpên Erebî kiriye tîpên kurdî yên nûjen, û têde serketiye, bi şirovekirina piraniya peyvên (*Binêr ferhengoka pirtûkê*) û bi xebata xwe ya hêja bo derxistina pirtûkê, wekî ew di maka xwe de hatibû lêkirin.

Hozanvan Şêx Mihemed Can xwe di dastana Leyl û Mecnûn de, bi Xakî nav dîke:

*Ya Rebb, tu Xakiyê gunehkar*

*Meh'rûm nekî ji şahê muxtar* (r. 44)

Bi mebesta: *Ey Xweda, tu (Xakî) yê xudan guneh ji mehderiya „şefae'ta“ cenabê pêxember, selewat û silav lê bin, bêpar nekî.*

Weku hozanvanê jêhatî Siyapûş dastana xwe (Seyfulmuluk) [*Binêre birr 5 ji gotara me*] li ser şehzadeyekî Ereb nivîsandiye, Xakî jî çêroka Leyl û Mecnûn ji çanda erebî biriye û li ser eşq û liyanîya Qeys û Leyla, ku herdu Ereb in, ev dastana mezin û xweşik lêkiriye.

Qeys ji Leyla hezdike, hema wê nadine wî, ew bi çol û bêşeyê „*Sehrayê*“ dikeve, şê û dîn dibe, û Ereb wî bi Mecnûn navdikin. Şehzadeyekî Erebî wî di rewşeke wêran de, xas û tazî, li çolê dibîne, wî bi xwe re tîne mal, pir rêzgirtin û xweşhatina wî dike, û soz dide wî, ku biçê Leylê ji wî re bistîne, çî bi mal û qeleng û çî bi darê zorê be. Gava bavê keçikê dayîna dota xwe neydike, di navbera wî û wî şehzadeyî de cengeke mezin dest pêdike, hema Qeys (Mecnûn) dirazan li ba Xwedayê xwe bo malbat û êla Leylê dike, ku ewana bi serkevin, ne şehzadeyê ku ji wî re piştvanê, ji ber ku her tiştêkî Leylê li ba evîndarê dîn û şê bihatire ji her tiştêkî dî di jîhanê de...

Xakî jî, wekî me gotiye pir destê xwe davêje “Pêdaçûnê”, bo xortkirina wateyên peyvên xwe. Binêre ew di vir de çî dibêje:

*Xîme bi mîsalê deşteke reş*

*Eqlê merivan dikir muşewweş* (r. 31)

[Xîme bi Erebi ye: Kon, **Muşewweş**: Tev li hev bûye, bi nav hev ketiye]

EW konekî mîna deşteke reş fireh dibîne, ku hişê mirovan tev li hev dike... Heger bigota wan xîmeyan ne pêdaçûn bû, ji ber ku gelek konên reş di ber hev de wekî deşteke wê dîtî, hema yek kon bi serê xwe wekî deşteke bixuye, piçekî pir û pir e...

Xakî li ba wê yekê namîne, ew bêtir pêda diçe û dibêje:

*Bê hed û e'ded cemel deranîn*

*Mecmûî' kirin ziyafe, danîn* (r. 33)

Ji mêvanan re bê hejmar (*bi wateya hejmareke pir mezin*) ji hêştiran bi tevayî serjêkirin û bo mêvaniyê danîn. Em tev dizanin ku bê hêştir êlên Ereban nedikanîn di bêşeyên fireh re bigerîna. Bo wê hêştir xudî dikirin, ji ber ku hêştir gelek rojan bê av dikane di bin barê xwe de bigavîne, carina hêştir jî wekî pez bo mêvanên xwe serjê dikirin, hema çî caran wan bê hejmar hêştirên xwe serjê nedikirin...Eve pêdaçûne, da hozanvan camêriya wan mirovan bide xuyakirin.

Li ser **Leylê** dibêje:

*Weqtê dimeşî li ser zemînê*

*Aşiq dimirin ji ber evînê*

*Ger dêm bike ez hîcabê a'rî*

*Şemsa li felek dibîte tarî* (r. 36)

Gava **Leyl** di nav xelkê re digeriya, dildar û evîndar ji derdê wê re dimirîn û gava çarîka xwe ji ser rûyê xwe bavêta, roya li asîmanê li ber wê dibû tarî, bi wateya sipîbûn û rohnîbûna dêmê **Leylê**...

Xakî jî gelek caran destê xwe davêje hejmarê, bo xortkirina wateyên xwe... Li jor (**Bê hejmar**) bi kar anîye û li vir wekî klasîkên me yê dî, dest avêtiye hejmareke pir mezin:

*Ne ku bi dilek, bi sedhezâr dil*

*Ew jî weh li Qeysî bûye mail* (r. 37)

Wekî ku liba **Leylê** (100000 dil) hebûne, ne dilekî tenê... Ew dixwaze xortbûna hezkirina wê bide diyarkirin...

Li ba wî çiya jî mîna mirovan xudan dilin, bi axîn û keserin, lew re ew dibêje:

*Bulbul ku ji xunçeyê qetandin*

*Ah û keseran çiya h'elandin* (r. 39)

...û li ba **Xakî** jî ji çavên evîndaran hêsir wekî lehiya çeman dibarin:

*Dengê wî hukum dikir li Leylê*

***Hêsir diwerî bi mîslê Seylê*** (r.40)

[Seyl bi Erebi ye: Lehî]

Sirûşt li ba hozanvan ên me yên kevnare bi giyan e, û di her helbesteke wan de mirov hinek dîmenên wilo berçav dike:

***Her pêlekê ba ku tê ji pê ra***

***Meh'bûbê dike selamê vê ra*** (r. 40)

Em dibînin ku ba wekî birîdê (Post) ji **Mecnûn** re silava dibe bo **Leylê**...

Li ba klasîkên me gişan dil ji ber evîne têye sohtin û wekî biryanê “kebabê” têye hûrkin û biraştin, û li ba **Xakî** jî ev dîmenê pêdaçûnê gelek bi kar hatiye:

***Der şeb diçû pêşê mahîtabê***

***Cerg û dilê xwe dida kebabê***

***Wî ahî dikir û dida hewaran***

***Herçî dibihîst şubhê baran*** (r. 50)

[Şeb: şev, Ahî: Axîn]

Bi şev diçû ber tava heyvê û cerg û dilê wî dihatin bizdan, dibûne kebab û biryan... Axîn û hewara wî bilind dibû û herkesê ku dibihîst hêsir ji çavan wekî baranê dibarîn....

Li dereka dî dîsa baranê ji çavên **Leylê** dibarîne, hema barana meha **Nîsanê**, ku gelek pir û xort e:

***Weqtê ku bima tenê ji însan***

***Baran dirijî ji e'wrê Nîsan*** (r. 71)

Wekî şêxekî sofî, **Xakî** jî dînbûn û şêtbûna **Qeysî** davêje ser **Xwedê** tea'la, eve jî baweriya giş helbestvanên me yên kevnare bû:

***Lêkin çî bikim, bi hemdê nînim***

***Ez girtiyê hakimê evînim***

***Ez kirme ji bo xwe e'bd û kole***

***Lewra me mekan çiya û çole*** (r. 60)

[Mekan bi Erebi ye: Cîh]

Ew nabêje ku **Qeys** ji ber evîndarî û jarbûna xwe ve ketiye wê rewşê, ew li ser zimanê **Qeys** dide xuyakirin, ke ev “*teqdîra Xwedê*” ye û **Xwedê** ew kiriye dîn û şêt:

***Teqdîrê Xwedayê la yezal e***

***Wî daye min ev girîn û nale*** (r. 60)

[Layezale bi Erebi ye: Her heye.]

Hema ev baweriya Cebriyan “*Binzorbûyan*” hîç ji hozanvaniya **Xakî** û hozanvanên me yê nêkê me. Ew helbestvanekî jêhatî û mezine. Binêr çî dibêje:

*Hem zulfê Leylê mîslê zencîr*

*Keftine unuq bi xeyrê teqsîr*

*Qatqatî li dorê bûne h’elqe*

*Der agirê işqê kirme h’erqe* (r. 60)

[Unuq bi Erebi ye: Histo, Teqsîr: Kêmanî, H’elqe: Qulp, Der bi Farsi ye: di. H’erqe: Sotîn.]

Zulfên **Leylê** ku wekî zincîr in, bê kêmanî bi ser histoyê wê de hatîne, qatqatî di dora histo re bûne qulp, û evîndar avêtine nav agirê eşq û liyanîyê, têde ew sotandine... Eve jî rewştineke klasîkî ya pir xweşik û delal bû li ba hozanvanên me, di civata me ya oldar û xweparêz de, ku bêtir delîveyên rewştina jin û keçan bo helbestvan ne asan bûn, bi taybet gava yek şêxekî ji şêxên civatê bû, wekî **Xakî**...

Wekî me gotî, **Xakî** bi pirkirina hejmarê, bi mezinkirina tiştan, û bi tûjkirina rewştan...bi pêdaçûnê, helbestên xwe dagirtine...Wekî di vir de:

*Leşkerê wî bi şubhê qûmê beh’ran*

*Xuddamî wekî nebatê seh’ran* (r. 72)

[Beh’r bi Erebi ye: zirê, Xuddam: Berdest, Nebat: Geya, Seh’ra: Bêşe, çol]

Leşker bi hejmarê ji qûma ber zireyê pirtire û berdest jî ji geyayê çolê pirtirin...!!!

An jî li vir:

*Esker bi mîsalê avê beh’ran*

*Daîm kişiyên li rûyê seh’ran*

*Bê h’ed û h’îsab ji hev dikuştin*

*Xwûnê wekî Seylê meyt dişuştin* (r. 78)

Li ba **Xakî** gava pevçûn di cengê de çêdibe, leşkeran bê hejmar ji hev dikuştin û xûn wekî lehiyê kuştî dişuştin. Ji xwe cengan herdem xûn û kuştin û hêsir pêda dikin û li pey xwe gelek çêrokên wilo dihêlin, ku hejmarên rastîn dibine hejmarin efsaneyî...

[*Bermayî heyê*]